

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo :

* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (148) | Sal 26 | 12ê Reşmeha 2021 z - 2632 k | Êmêl : Newroz@yek-dem.com | Buha (100)L.S

# Nalîn û Hawara Efrînê!



## Desteya sernivîser

Ne tenê di dîroka gelê Kurd, lê belê di dîroka mirovahiyê bi tevayî de, roja Şemiyê 20ê Çilleya 2018an, roja destpêka şer li ser Efrînê di siha bêdengiya hêzên mezin ên cîhanê de ji bal artêşa Tirkiyê û çekdarên xwefiroş ên Sûrî ku navê «Artêşa Niştimanî» li xwe kirine, rojeke reş û tarî ye, roja kuştina aştî, mirovahî û ronahiyê ye. Rojeke wiha ye ku tewan û hovîtiyê hemû bend û sînorên xwe derbas kirine, bi pilan û zikreşiyeke kesnedî xwîna Kurdên sivîl ên bê sûc û bê guneh hatiye rijandin, mêr, jin, zarok, kal û pîr hatine kuştin, û tariyê konê xwe hawîr vegirtiye!

Di vê rojê de, biryara dagîrkirina Efrînê fermî hatiye wergirtin, bi dehan firokeyên cengî dever û cîgehên Kurdan bombebaran kirine, bi çekên giran, ji hemû aliyan ve, gund û bajarên Efrînê dane ber topan û mirina reş li xelkê belav kirine. Ji neçarî, gundiyan mal û milkên xwe li şûn hiştine, koçber bûne.

Wekî Kurdan gotiye»Dîtin û bihîstin ne weke hev in». Di van her sê salên borî di siha qedexekirina alavên ragihandina .....

2

# Li Nexweşxaneya «Dil û Çav» li Qamişlo Neştegeriya Dilê vekirî



**Kurte hevpeyvînek bi Dr. Selam Hesen re**

Weşana NEWROZ xêrhatina we dike, bi baldarî û dilekî xweş niştegeriya we li bajarê Qamişlo dişopîne. Bi rastî, ev karekî mezin û pîroz e, cîgehê dilşadiya me, hemû xelkên Cizîrê û Kurdan bi tevayî ye. Dr. Selam ku ji herêma Efrîna birîndar a dagîrkirî ye, ji kerema xwe, tê xwe bi xwendevanên NEWROZê bidî naskirin?.

1- Ji kengî ve tu li derveyî welêt dijî, çi bûn ew sedemên ku hiştin tu ji Ewropa .....

8

# Li Nav Enkûrê Xelkê Meçêre

**Mihemed Qere Hesen**



Ger tu çêl û mî yî, wê te bidoşin, an ga û beranî ji cot û kêranê wan re yî. Û hespî ji siwar bûna wan re yî. Ji serpêhatî û bûyerên bi merov an gel re derbas bûne, nivişk jê tê birin ku tu kar bê nirx, bah û sermiyan netêkirin, bi taybet karê konevaniyê û berjewendiya dewlet û gelan, ji ber wê her alîkî li sûda aborî, konevanî, ramyarî û …xwe digere, li ber wê nêrînê pilana xwe dirêsin û dihûnin, ew jî bi şiyanên zanistî, aborî, nîr û lîsk di deriya berjewendiyê de bi pêk tên. Ev ton kar pir bi serê Kurdan hatine kirin û bûne qurban wan kiraran. Em gavek ne pir dûr bi paş de vegerin, gava şoreşa îktoberê li Rûsiya bi serket û partiya komonîst deslat bi dest xwe ve bir, bi mîkroskopê li gelên kêm hejmar gerîn û ji wan re di komarên ew lê dijîn de xweserî çêkirin, ji dêrisbûnê hatin parastin û xwe ji nûh ve vejandin. Ew jî ji bona ku dewleta Sovyetê bimîne mezin û di hemî waran de li ser lingên xwe raweste û serê xwe di serê dewletên mezin û pêşketî ke. Ew pilan kanî cîbicî bikira, rol û bandora xwe li beşekî mezin li dewletên cihê dibû.

Îro pêmaya sovyetê di hemî war û berghan de bi Rûsiya ma ye, ji ber Rûsiya li ser pişta wan gelan bûye dewletek mezin û pêşketî bi nêrvîna pir gel û dewletan hukariyê dike. Ji wan serphatiyan Kurdistana sor, gava hate avakirin, tavilê zenglê sor û biveyê li ba dewleta Turkiyê lêket û bi biveya wê hay bû. Ew xweseriyê çiqas biçûk û teze bû, lê bibû navendeke vebiruşîna ramana şiyarkirina netewî, hukariya xwe dê li gelê



Kurd biba û ewê ji pêlanên bi navê ol, dîn, niştman û delwlêtê rizgar bibana, belkî rewşa Kurda ne wek ya îro ba jî. Tavilê Mistefa Kemal Atetork rola xwe bi rêya komara Ezerbêcan lîst û xwe gihandin serokê sovyetê Istalîn ku xweseriya Kurdistana sor li Kerbaxê biveyê li serê asayîşa me tevan çêdike, divê ew were hilweşandin. Wê hîngê konevanên Turkan bi şiyar û rabûna gelê kurd li beşê Kurdistana di bin destên wan hay bûn.

Gava ew ji Turkan cihê bibin dewleta wan dê di herêmê û cîhanê de rola wê dê jar bibe, û ew carek din weke cîhangêriya wan perçe bibe, wê tirsê ta roja îro pişta wan qurifandiye, û çirûskek Kurdan li kîjan beşî vêkeve ew dikin ku vemrênin, ta gotine ger konekê kurdî li Efirîqaya venin, emê hilweşînin!. Li dêvla ku weke dewletên pirgel bi çareseryê biraman û dewlek fidral ava bikin û li hespê şaristaniyê siwar bin, li kerê şeytên, şer û dêriskirina Kurdan siwar bûn. Pir rast bû gava tevgera kurdî li Sûriyê bendekî serek di rêbaz û pirograma xwe de danî bû. Divê em li ser şiyana gelê kurd a aborî rabin destên xwe nedin rijêmên ku beşekî kurdistanê din destê wan de ye, ji ber ku gava ew rijîm berketî û piştgirê mafê Kurd e li perçê .....

3

**Sê Sal ... Dûmahîk**

serbixwe de, bi hezaran tewan û kiryarên hovane ji bal dewleta dagîrker û çekdarên terorist ve li Efrînê bûne û hê jî dibin, piraniya wan veşartî mane, ragihandin û raya giştî wan nabihîze!.

Bi armanca valakirina devera Efrînê ji xwediyên wê yên resen ku 97% Kurd in, ji bav û bapîran ve li gund û bajarên xwe, ser xaka xwe dijîn, dewleta Tirkiyê. Ji bilî girtin, revandina jin û zarokan, kuştina bêsûcan, diziya bermayên kevnar û hilweşandina gorên navdarên Kurd û herifandina perestgehên wan, ew siruşta welêt jî talan dikin. Ji dema dagîrkirina Efrînê ta roja îro, agir bi 40 deverî ketiye û bêtir ji 5000 darên zeytûnê hatine hilkirin û şewitandin û bi dehan jî darên mezin ên dîrokî ku temenê wan ji 100 salî bêtir e hatine birîn!

Ev e sê sal in ku xelkên Efrîna birîndar taromar, koçber û belav bûne, gelek ji wan koçberan di bin çadirên kampan de azarên giran dikşînin û jiyaneke dijwar derbas dikin, li hêviya wê rojê ne ku ev sitema mezin ji ser wan rabe, kujer û tewanbar bêne darizandin û ew vegerin malên xwe, ser gund û zeviyên xwe yên talankirî, careke din jiyana xwe ya aştiyane bidomînin. Ji bo bicîanîna vê hêvî û armancê, her dê kar û xebata me Kurdan berdewam be û em bêhêvî nabin!

**Nav Enkûrê... Dûmahîk**

ne di bin destê wê de, berî wê bila doza gelê Kurd li ba xwe çareser bikin, ji dêvla piştgiriya xwe nîşan bidin. Li ba wan têklî dimînin tektîkî ne dirust û resen in, û wan çar rijîman di tenga doza kurdî re pir hajî hev hene û alîkariyê li dijî doza Kurd ji hev re pêşkêş dikin. Lê li hêla beşê kurditanê yên ku berê xebat xwe dane şerê çekdarî û dest pêkirine. Tê xuyan wan rewşa her dewletekê baş ne pîvan û nirxandibûn, ji ber wê piraniya partiyên herdu beşên bakûr û başûrî kurdistanê di nav lingên rijîmên Sûriyê, Îraq, Îran û Turkiyê de hatin civlandin û pir caran biryarên xwe yên serbixwe derdane û li dijî hev ketin şerê birakujiyê, dubendiyê û ziyanên mezin gihêştine doza kurdî, sedema herî mezin ji wê çerîna li nav enkûrên rijîmên ku Kurdan diçewsînin de bû. Ji ber ku gava tevgera kurdî li bakurê Kurdistanê dirûşma xebata çekdarî hildane baş şiyanên xwe û rewşa dewleta Turk têde nehatibûn pîvan û nirxandin. Hin ji wan.

1- Dewleta Turk cihakî xwe pir stirtêcik di rojhilata navîn de girtibû. Nîzîkbûna wê li ser sînorê yekîtîiya sovyetê. Dewleteke di peymana Etlesê de. Dostê herî serek ji îsrayîlê re…

2- Gava dest bi teqîna qurşînê bû, tavilê dewleta Turk bi têklî û piropagenda xwe kanî bû destê xwe bi tenî di rûyê Kurdan bida û bi terorê gunhkar bikira. Di vê kefteleftê de bi serket, piraniya dewletên sereke di peymana Etlesî de bi daxwaz Turkan re erê kirin û Kurd kirin terorisrit, tevî Kurd ew xwedî maf in û xebata wan li gor belgeyên navdewletî rewaye. Ta roja îro em wê ziyanê dikşînin û baca wê didin.

3- Gava biryara şerê çekdarî hat birin, tavlê şer bi peymana Etlesê re hat vekirin, li gor bendên wê yên asayîşa netewê ji yên hev in, û divê berevaniyê ji hev re bikin.

4- Di aliyê pêşketina tiqenî, zanyarî û pêşesazî de, dikanî sûde jê bigirta û bibe dewletek xwedî giranî û rol di rojhilata navîn de, nimûne çêkirina balefirên bê şofêr de ji Îsraîlê dibe, ji ber wê îro di herêmê de serê xwe dike yên dewletên mezin û di pir ciyan de ya xwe dibe serî, kaxez û alavên konevanî di destê xwe de kom dike û bi hêzên mezin re dikeve bazarê û bi hev diguherin.

5- Xwe weke dewletek serkêş ji cihana îslamî re dibîne û hemiyan li dor xwe kom dike û pê karê xwe dike.

6- Ew cihê xwe yê giring( stiracîkî) di heremê de li ser kêndira bi Rûsiya, Awrupa û Emêrkane re dilîze û bazara xwe di hemî aliyan de dike.

7- Kurdistan bê gundewar bû, û bi hezar gund hatin hilweşandin û xelkê wan goçê bajarên mezein ên ne Kurd, wek Îstnbolê, Ankerê, û…bûn.

Gava gelê Sûrî livî û daket şarêyan û doza azadî, rûmet û jiyaneke nû kir û bi şêwe û teherekî aştiyane xebitî û doza rûxandina rijîmê kir. Li hember wê ji rijîm li serê xwe nîşt û daxwazên gel di hemî layane de cîbibcî nekir, bi qurşînan li ber xwe xwepêşandana rawestî û sivîl bi hezaran kuştin û Sûriyê ber ve gola xwîn dibir, û berê xwe da Mosko û Tehranê û piştgirî ji wan xwest, ji bona ku daniştoka deslatê bihêle çû li nav enkûrê wan çêrî û biryara pirsiyariya niştimanî û serbixwe derda, û ew rewş bû keysekê zêrî bû ji delwtên destêwerdan re û ji rêxistina Îxwan El-mislimîne û aligirên wê re hat ku şoreşa sivîl û aştiyane ber ve çêkdariyê û dîndariyê bajon ,her yek ji wan dewletên destêwerdan li ber pirojek xwe bûn. Ne bes rûxandina rijîmê bû, lê avakirina dewletek olî wek a Talban û Beşîr û Erdoxan ava bikin bû.

Gava aliyên dîndar dest bi şer kirin û serek dewleta Turk ew hembêz kirin û dest danîn ser biryara wan a niştimanî û ji dest girtin, û ew weke nandoz ji xwe re bi karanîn, ji ber ku hemî aliyên şerker li nav enkûrê xelkê diçêrin û pişta xwe bi xelkê xwe girênedane û qurşînên xwe kirine sîngên hev û roja sûdê ji wan dibin. Loma herdu aliyan terorist li seranserî cîhanê kom kirin çi Şi›î an sunî li nav garisê Sûriyê şer kirin. Û welatê me kirin vê rewşê hêj ev jî berdewame û em baçê didin û di dozexê de dijîn. Derd û xema herî mezin ji dewleta Turk re li herêm hebûna Kurdane, û di vê qonaxê de Kurdên Sûriyê. Ji ber ku bûne xwedî hêzek leşkerî û beşek ji cigrafiya Sûriyê di bin destan de ye, û serweriya wê dike. Piştî dewleta Turk hemî milsên Îslamî û terorist û nûnerên wan ên konevanî( hemaheng û komîta destûrî ) kirin destê xwe, bi vehesî wan dibin her derê ( Lîbiye, kerebaxa Ezerbîçanê û çêra keşmîra Pakistanê jî dikin ) û weke nandoz û terorist bi kartînin. Nemaze li dijî kurdan çi pê Efrîn, Serê kaniyê û girê Sipî û dike ku herêm in din ji xaka Sûriyê dagîrkir bike û pilanên xwe li dijî kurdan ( guhertina demografî, û zorkirina ku kurd di goftûgoya xwe de bi ser nekevin dike, û binpê û mendelkirinên( înkar) ji maf û mawdanên herêman di bin destên wan de) dajo berdewame. Lê tiştê herî giring ji me kurdên Sûriyê re ew e ku guftûgoya kurdî here serî, ji ber ku ev derfeta zêrîn ji me re hatî ji destên xwe ber nedin, tu rojan nedihat bîra tu kesî, ku Kurdê Sûrî bibin xwedî hêzek leşkerî û pê xwe biparêzin û bibe paldank ji misogere kirina .....

4

# Nalîna kalemêrekî Ji Hundir Efrînê

**Zanistê Comê**

Çiqas bibe kesê dibîne û di nav de jiyana rojane diqedîne, ne wek kesê dibîse yan di riya alavên raghandinê re dibîne. Mirov dibîse û dibîne ev kesên ku dev ji Efrînê berdane, û her yek bi deverkê de çû ye, û her yek ji wan di bin bandor û sedemên bi wî ve girêdayî, xwe li ser rastiyê dibîne, û ger derneketiba, dawiya jiyanê bû ji ber ku zarok, wê bê xwendin bimana, wê tî û birçî bimana, keç, pîrek û xortên me wê tarûmar bibana,li dawiyê her yek ji wan sedeman ji xwe re datîne, ku çima ji Efrînê koçber bûye . Bi fermî hejmara kurdên li Efrînê mane, û yên koçber bûne ne diyar in. Û yên li Efrînê bi serbest û vehesî nikanin karê xwe yên rojane bikin, ji ber ku di bin destê milîsên Îslamî yên hovane û dakgîrkeriya Turkiyê de ne,û hemî reng û şêweyên nû ji zor û zînatêbi serê wan dikin. Apê Misto û pîreka xwe ve nimûnake ji malên



ku li gundê xwe mane xwediyê çar zarokane, terektor, turumbîl, du avahî li Efrînê bilî yê li gund, du dîkan li ser riya Reco û sê çarsed darî zeytonê xwe bûn, di xêr û xwaşiyê de dijiyan xema dawiya temenê xwe pir ne duxwar ne di dema rijîma sûryê de û ne jî di dema rêvebiriya xweser de tu kesî ji wan bi darê zorê tişt jê nedistandin. Lê mixwabin û kes nebîne piştî kulî û mişk bi Efrînê ketin, hemî tişt xwarin û mişkan hemî dever û kolan hilweşandin. Di talanê de derektor û kelûpelên dîkan û malan tev biribûn. Piştî dûrketina apê Misto ji Efrînê bi çend rojan vedigere mala xwe bûye wek dibêjin ( mala gur e ne ard û ne burxul e). Rojê carekê û du caran kulî û mişk dihatin apê Misto ku ji mal bi derxînin lê pîreka apê Misto ber xwe dida û bi ser wan de dikir qîjevîj û digot: Mal şewitîno, ma we tişt bi me hîşt emê ku va herin ?. Dikan birin, derktor we birin, malên li me birin, mala me li gund vala kirine, bes dîwar û bilat mane.

Piştî çûn û hatina wan bi deh caran û bi darê zorê ji apê Misto û birayên wî û çend mal din ji gund, ji her yekî $٢٠٠٠ standin, ta hîştin ew di malên xwe de bimînin!. Derd û kulên apê Misto pirtir dibûn li pêş çavan pezê wan di nav darên zeytonê de dihat çêrandin, hemî tiştî didizîn ( dîrakên telefûn û kehrebê, deriyên dibistanan, matorê avê yê ku av didan gundan, bilî genim, ceh û zêtûnan ....H.W.D) kezeba apê Misto dişewitî û di xwe de diqewirî. Dema bi çavên xwe dibîne ew darên zêtûnê yên bi sed hezar caran di dorê re digeriye û bi xûyê eniyê xwe mezin kirine ji bin ve hatine birîn, girî dikeve xirnaqê gewiyê û hêstir ji çavan dilop, dilop diweşin, nema dizanê loma ji kê bike, ji zarokên xwe yên ku ew bi tena xwe hîştine, yan ji tevgera xwe ya kurdî ku yê cefa û keda bi deh sala di nav de xebitî ye, yan jî ji qederê bike. Şêtmêt dima ji karê mişk û kuliyan û alîgirên wan, ji ber ku tiştê dihat kirin û hêj tê kirin li tu deveran li seranserî cîhanê û bi teybat li sûryê nehatî kirin !.. Ji ber ku di serê wan de hatî çandin Kurd gawir in û divê tî û birçî bibin ta ji Efrînê birevin û barkin. Apê Misto baş dizanî û têdighîşt ku ev gilgemara anîne Efrînê ne ji bo partiyekî yan dudiyan e, lê belê ji bo pişaftin û tunekirana gelê Kurdan ji efrîn, ew kesên dibêjin ji bo rakirina p.y.d an pkk, her roj tekez dibe ne rast e û derewek mezin e û ta niha hin aqilkêman di wê baweriyê de ne, ku ne ji Rêvebiriya Xweser ba kulî, mişk û Turkiyê Efrîn dagîr nedikirin!.

---

**Nav Enkûrê... Dûmahîk**

mafê kurdan re, tiştê vê hebûna bi hêz bihêle bi serkeve, yekîtiya Kurdane. Ji birayên me yên li başûr û bakur tê xwastin ku yekîtiya vî beşe bi ser berjewendên partîtî, bîrdozî û kesane din, destên xwe ji lihevkirinê re dirêj bikin, ne mirûdan ji xwe re çêbikin û yên li govenda wa sema nekin di ser re gavkin.

Di vê qonaxê de neyarên gelê Kurd pir di nav nakokiyên Kurdan de dixebtin û dilîzin hin bi gef û guran hin jî dandina peran, ku pirtir ji hev jêbikin û vê derfetê bi derdin. Ji herdu aliyên guftûdar tên xwestin her yek ji aliyê xwe ve pirtir li hevkariyên xwe vergere, nemaze aliyê E.NK.S têkliya xwe bi hemahengê û dewleta Turkiya dagîrker re û yekîtiya kurdî bi pêş têklî bi wan re de, û ji aliyê din jî tê xwestin yekîtiya Kurdên Rojava bi pêş têkliyên bi partiyên bêşê Kurditanê din de. Divê hemî aliyên Rojava xwediyê biryara xwe ya niştimanî kurdî sûrî serbixwe bin. Miletê ku dilopên barana welatê xwe di kevçika dilê xwe de kom neke dê di bin simiyên zordaran de bi miçiqe.

# DU KELEHÊN BERXWEDANÊ... Lê!

**Leheng Efrînî**

Du kelehên berxwedanê, yek Efrîn a din jî Kobanê, bi fedekarî û Qehremaniya (YPG, YPJ) deng dan û bûn nimûne li cîhanê, simbola berxwedaniya Kobanê «Arîn Mîrkane» û ya Efrînê jî «Avîste Xabor» û «Barîn Kobane», û herdu keleh xwediyê bi hezaran dastana ne. Lê, pirsa xwe çedike meydanê û tê ser zimanê piraniya xelkê me yê Kurd, ka çima li Kobaniyê serkeftin, û li Efrînê jî şikestin? Ma Qehremaniya (YPG, YPJ) li Kobaniya deşt û dûz ji ya Efrîna çiyayî, gelî û daristan zêdetir bû? Carina jî hin dixwazin rizgarkirina Kobaniyê di hatin û tevlêbûna giropek pêşmergan tenê de bibînin. Bi dîtina me, ne qehremaniya li Efrînê bûye kêmtir bû, û ne jî hebûna pêşmergan bi tenê sersebeb bû. Emê li jêr merc û heyamên hîştine li Kobaniyê serkeftin û rizgarkirin be, û li Efrînê şikestin û dagîrkirin be, ji xwendevanên xwe re, rêz bikin: Li Kobaniyê êrişker û dijmin Rêxistina Da›işê ya terorîst (a ku, piraniya civaka navdewletî û bi awakî fermî li dijî wê derketiye) bû. Lê, li Efrînê êrişker Rijîma Turkiyê (ya endam di Nato de) û bi dehezaran nandozên wê ji milîseyên cîhadîst ên Sûrî - Ixwanî, û bi serokatiya Erdoxan (neviyê Ataturk û sultanên Osmaniyan) bûn. Li Kobaniyê Kiwalisyona navdewletî ya li dijî Daişê û bi serokatiya Amerîka piştgir bû, û raya giştî û gelêrî û ragîhandina cîhanî bi deng bû. Lê, li Efrînê hin dewletên zûlhêz mîna Rûsiya çira kesk ji Turkiyê re vêxist, îranê piş guhê xwe xurand û li heza wê û Rijîma Sûriyê hat, Amerîka paşguh kir û got em li Rojavayê Ferêt ne berpirsiyar in, û piraniya civaka navdewletî yên bi bandor jî bêdeng man û xwe ker û lal kirin. Li Kobaniyê balafirên Kiwalisyona Navdewletî alîkar bûn û li Da›işê xistin. Lê, li Efrînê /73/balafirên Turkiyê hemî xaknîgariya wê bostbibost armanc



dikirin. Li Kobaniyê hêzek ji Pêşmergeyên Herêma Kurdistanê bi top û tangên xwe yên orte û giran, her dihat xwestin piştevaniya şervanên (YPG, YPJ) dikirin, û cîgehên Da›işê topebarandikirin. Lê, li Efrîna birîndar tu alîkariyên weha tunebûn. Li Kobaniyê hemî partiyên Kurd li Sûriyê piştgiriya şervanên me dikirin. Lê, li Efrînê beşekî ji Tevgera ma ya Kurdî (ENKS) bi kêmanî ne li rex şervanan bû, ger em nebêjin bi hêzên êrişker re alîkar bû. Li Kobaniyê (Artêşa Azad) piştgiriya xwe ji YPG û YPJ re li dijî Da›işê nîşan da, û ta hêzek jê derbasî Kobaniyê jî bû. Lê, li Efrînê (Artêşa Niştîmanî) ya bi ser Hemahengiya Niştîmanî ya Sûrî ve, beşekî sereke û li pêş Artêşa Turkiyê ya êrişker bû. Tenê tiştê balkêş ku, li Efrînê hebû û li Kobaniyê tunebû, gelê Efrînê /58/ rojan bi şervanên xwe re, bû yek û bi tenê li şûn xwe bernedan. Bi ser ku, merc û heysmên şer ên hebûn ne di berjewendiya berxwedaniya Efrînê de bûn, lê dîsa jî wê bi şervan, partî, mêr, jin, xort, keç, kalemêr, pîrejin, zarok, dar, zinar, çiya û newalên xwe ve, berevanî û fedekariyeke bêhepa pêşkêş kir, bi hezaran şehîd û birîndar dan, /58/rojan li ber xwe da, bi hezaran dastan nivîsandin, bi Kobaniyê re bû hevalcêwî, û li seranserî cîhanê deng veda, û ta niha jî li berxwe dide, û tucarî ta rizgar nebe, radest jî nabe... Lê, heyf û mixabin...Bila çavên felekê û dijminên Azadî, Aştî û Wekheviyê û hemî zordaran birjên.



## Viyan Mihemed Elî, bi pileya rûmetê, Macistêr li zanîngeha Helebê stand

Li 03.02.2021an, zanîngeha Helebê, kulîja Zanînan (Elilom), xwendekara kurd a ji Efrînê «Viyan» keça nivîskarê hêja Dr.Mihemed Ebdo Elî, nameya xwe, lêkolîna di bin navê «Bandora ava miriqê ya guvêşgehên zeytûna li ser bûyna Genimê nerm û Berberokê» ya pileya Macistêr, pêşkêşkir.

Piştî ku, komîta pîvanê pirs û danstandinên xwe bi Viyanê re kirin, kêfxweşbûn û pir pesna wê dan, û biryara serkeftinê, pileya 98%- a Rûmetê jê re standin.

Xwendekara me ya zîrek, a ku, nameya xwe ji Efrînê re diyarkirî, ciyê serbilindî û şanaziyê ye.

# Dr. Nurî Dêrsimî... Jînenîgarî /Biography

Beşê Duwemîn

**Ibrehîm Şitlo**



Di 1962-an de, yek ji Şagirtên ku biminre(Dilawer B.) li Dibîstana El Maemûn – Kolana Cemîliyê dixwend,( ji aliyê devera Derbêsiyê-Cizîrê bû an jî Gundê Bavê wî li wir bû)li nêzîka min li Camîlîyeh dijiya, got ku ew kesê Kurd ku li avahiya Gozim dijiya Qehremanekî Serhildana Dêrsimê ye, Navê wî Dr. Nurî Dêrsimî bû.

Bi xwîngermiya dilê xwe min dubare û bi tundî jê xwest ku navnîşana wî – Doktor Nurî Dêrsimî - ya nuh ji min re peydake ji ber ku ez dixwazim biçim serdana wî ta ez wî Kesî dîrokî binasim.

Bi rastî, hîna 2 Hefte derbas nebûn ku hevalê min Mizgîniya navnîşana Dr. Nuri Dêrsime ji Diya xwe stendiye, lê ji bona serdana Dr. û ji ber vê yekê Diya wî got:

„Divê pêşî ez telefûna Doktor bikim ta ji te û Hevalê tere destûr bistînim û Sozekî li gora demê Doktor bi Roj û dem ji we re bigrim."

Çend rojan dirêj nekir hevalê min Dilawer. B ez agahdar kirim Ku Diya wî Sozek ji me re stendibû, ji ber vê yekê em li gorî wê li ser wê sozê çûn Koloana Mehetit Baxdad , ku em ketin avahiyekê û bi neh/ deh pêlikan de hilkişiyan jor, û deriyê yekem li rastê bû û li ser zengila wî bi Erebî hatibû nivîsandin:

د.نوري ديرسيمي –
فريدة غزأوغلي

Doktor Nûrî bixwe Rûgeş û bi Dengekî xurt bi gotina:

«Oooh…Xortên hêja… Fermo…keremkin».

bixêrhatina me kir,û ev Civîn destpêka naskirina min a kesane bi Dr.Nurî Dêrsimî re bû.

Bejna berêz Dr. Nurî Dêrsimî navînî, taybetmendiyên rûyê cidî, rengê gewr/ spî, dengê xurt, xuyangiya wî mirovî bandora Kerîzma Kesê bi xwe bawer û bi xwe dide der bû.

Piştî Serdana yekemîn min çûyîna xwe mala wî li pey hev û bi tenê bêyî agahdariya hevalê min yê dibistanê Dilawer.B dubare kir. 6- 7 meh/ heyv derbas bûn îca têkiliyên min li gel Dr. nemir Nurî Dêrsimî roj ji rojê bi bîr û bawerî xurtir dibû, hema li dawî ez bûm kurê malê.

Xaltîka hêja xanim Ferîde jî her bi serdana min dilxweş dibû. Wirde wirde jî tiştê malbatî yê taybet jî ji min re digotin.

Peyv û gotinên min bi Apê Berêz re her li ser bingeha dîroka Kurd û Kurdistanê, şoreşên sexwebûnê bû. Carna jî me xwendina yek ji wan pirtûkên ku min ji kitêbxaneya wî dikir.

Gelek caran, Apê qehreman kitêba xwe ya bi Zimanê Tirkî çapkiribû: «Dersim Kurdistan Tarihinde» ji min re dixwend û bi Kurdî wedigerand û taybet ew banga wî ji xortên Kurdan re bi xwîn germî bi dengê xwe xurt ji min re dixwend.

Min jî jê re nûçe û dem û dewrana civata Kurd li Rojava hewldida.

Eger carna rojname û çapemeniyên Erebî yên li Bêrûtê çapdibûn مجلة الأسبوع العربي – جريدة الحياة – مجلة المصور المصرية Nûçeyên şoreşa li Kurdistana Iraqê û rêber Mela Mistefa min jê re dibirin û jê re dixwend.


Ji ber ku ez endamê Partiya Demoqrat a Kurd - Al-Parti - bûm, partiyê ez bi riya rêheval Midewer Ebdil Henan ku ew di wê demê de Berpirsiyarê min bû agahdar kirim ku pêwîste ku ez têkiliyên xwe li gel Dr. Nûrî Dêrsimî rawestînim:

Sala 1965an rojekê heval Midewer Ebdilhanan hate ba min mal û got:

«tu diçî ba Dr. Nurî Dêrsimî, Partî ji te dixwaze ku tu çûyîna xwe ba wî rawestînî.»

Min bersiva wî wilo da û got:

«Dr. kesayetîk welatparêze, ez bi çûyîna xwe ba wî niştmanperwerî jê fêr dibim, Kitêbxana wî



jî gelek dewelemende, ez kitêb û dokuminta li ba wî dixwînim, lewra pêwendiya xwe li gel Dr. Nûrî Dêrsimî bernadim.»

Lê berêz Midewir li min vegerand û got: «divê yan tu bimînî Endamê Partî, an jî tê herî ba Dr. Nurî Dêrsimî.»

Heval Midewer ji cihê xwe helsa ser piyan û bi hêrs li min vegerand û got:

«Tu mijûl bibe û ezê piştî çend rojan werim û bersiva te ya dawî bigrim.»

Piştî 23- hefteyan heval Midewer serdana min kir û pirsî:

«Ka,te çi biryar da?.Tê bimînî Endamê Partî an tê çûyîna xwe ba Dr. N. Dêrsimî berdewamkî?»:

Min bersiva Kadiroyê Partî heval Midewir Ebdilhanan wilo da:

«Ez partîme û ezê her biçim ba Dr. Nurî Dêrsimî.»

Berêz Midewir bêdeng ma û me civîna xwe weke her car li ser kar û xebata Partî bire serî.

Piştî wê bi du hefteyan, heval Midewir hat ba min û kitêba .....

# Tîma Efrînê... Çirûskek di dilê koçberan de ye

**Nazdar Hesen**

Em dikarin bibêjin, peyva Efrînê li ba efrîniyan û bitaybet li ba efrîniyên koçber yên ji ber dewleta turk ya dagirker û çeteyên wê, bi neçarî ji cih û warên xwe bi dûrketine û koçbarkirine, peyveke pîroz e, jêdera domandina jiyana wan e û tu carî vîna wan ya vegerê tevî êş û azaran lawaz nake.




Ji ber vê yekê, ger peyva Efrînê bi çi ve were girêdan, dilê efrîniyan tev pê ve tê girêdan û guhdana biçûk, mezin, jin, mêr, kal û pîrên efrînî pirtir bi Tîma Efrînê li van çend salên dawiyê balkêş û diyartir e, ku ew ne tenê hezkirên lîska gokê ne, lê ew pirtir evîndarê navê Efrînê ne, Efrîn ji wan re bûye derd û kula herî mezin û vegera li deşt, zozan û çiyayên wê bûye xewna roj û şevan. Belê beşdarbûna rêjeyek bilind ji koçberên Efrînê li matçên vê tîmê bi dilgermî, wêrekî, bi moralên bilind, bi def û zirne, stran û dîlanên folklorî yên kurdî, tabloya folklora Efrînê tîne ber çavan û girêdana wan bi netew û axa wan ve tekûztir dike.

Belê, Tîma Efrînê bûye çirûskek di esmanekî tarî de, dilê koçberên Efrînê yên bi xem û kederan werimîne, piçekî hêmin û aram dike, lewre, û ji ber ku ton çalakiyên wiha bandorê li mirov dike û dikeve xizmetê wê civakê û wê diparêze û pêş dixe, ji me tê xwestin em jê re alîgir û piştgir bin.

---

**Nurî Dêrsimî... Dûmahîk**

Şoreşên BARZAN ji Sala 1931 – 1939 bi Zimanê Erebî:

– 1931

1939 بقلم المحامي معروف جياووك

Li pêş min dît, Midewir ji min pirsî:

«Ev çi kitêb e?»

Min got: «Ev kitêbeka giranbuha ye, Nivîskarê wê berêz Merûf Ciyawûk e, bûyer û pêhatiyên têde hatine nivîsandin gelek hêja ne, ji ber ku her tiştek û her bûyerên têde bi nav, dem û cih bi durustî hatine dokominto kirin, min tu caran û ta Îro weke vê kitêbê bi rêk û pêk ne dîtiye.»

Midewir ji min pirsî: Te ev kitêb ji ku peyda kiriye?

Min jêre got: ji kitêbxana Dr. Nurî Dêrsimî.

Midewir dest avête kitêbê, piştî ku çavên xwe li çend rûpel gerand, destûra kitêbê ji min xwest û pêre jî got: Ezê bixwînim û di demek nêzîk li te vegerînim. Piştî soza vegerandina kitêbê bi Sûnd û peyman da min. Min jê bawer kir û heval Midewir kitêb kire paşila xwe û oxir ji min xwest.

Lê piştî wê rojê çavê min cardin li kitêba حركات بارزان بقلم المحامي معروف جياووك neket, her gav ku min heval Midewir didît min pirsa kitêbê jê dikir, lê wî her car bersiva min wilo dida: «Ezê li te vegerînim»,.

Min Ji bo wenda kirina wê kitêbê xwe gelek li pêş Apê xwe berêz gunehkar dît û li ber xwe ketim û paşîman bûm ku çawa min ew Sûc kir!? Ji vê yekê min çûyîna xwe bi derengî xist û ez paşîman û şêt mabûm ku ezê çi ji Apê xwe re bêjim?

Li Dawiyê min birayara xwe da ku ez sardana Apê Doktor bikim û rastiyê jê re bêjim.

Lê Apê hêja Dr. Nurî Dêrsimî bi paqijiya dilê min bawer bû ji ber wê jî dilê xwe ji min negirt, tenê qewîtiya xwe ji min re wilo got:

«Lawê min , divê ev ji tere bibe ders da, tu kitêban car din nedî her kesî.»

Min her guh neda xwesteka partiyê û min serdan, çûyîn û pêwendiya xwe roj bi roj nêztir dikir, û Apê qehreman gelek caran şîret li min dikir ku ez ji partiyê dûrkevim û gotinên wî hîn jî di guhên min de ne:

« Lawê min viya ne Partiye, viya Patirtiye!.»

Derbarê qedexekirin ü rastdariyên Partî yên ji bo pêşîgirtina min li serdana Dr.Nurî Dêrsimî, ev bûn:

Dr. kesek paşverûye ew Endamekî pêşeng ê Partiya Xoybûne. Xoybûn ji hêla hin kesên foydal û paşverû ve tê rêber kirin û ji ber vê yekê dijminatiya partî û rêgezên wê yên pêşverû dike. Pêdivî ye ku endamekî partiyê bi Dr. Nurî Dêrsimî û hevalên wî yên paşverû têkiliyên dostane neke!

Li vir, dema ku birin û wendakirina kitêba : Şoreşên Barzan…tê Bîra min, ji min re diyar dibe ku mebesta berpirsyarê min berêz Midewir ew bû ku Dr. Nurî Dêrsimî ji bo wendakirina wê kitêbê xwe ji min bixeyidîne û ew jî bibe sedema aloziyek ku li dawî baweriya Dr. bi min nemîne… û her pêwendiya min li gel Doktor were birîn.

Wilo jî Kadroyê Partî wê bigihîşta armanca xwe.

# Zimanheziya bijîjkekî Kurd

Dr. Memo Abdî



Min çiqas xwest textoriyê bi kurdî bikim, mîna bijîjkekî kurdîhez. min hewldida têgehên bijîjkiyê wergerînim zimanê dayika xwe, da ku ferhengeke bijîjkî-tendurustî dabimezrênim. asteng û çeper li pêşiya min mîna davkan hatin danîn. Û ez jî weke ordek û tilûrên xwezaya welatê min ketim xefka vedayî li hawîrdorê min . Min niyazdikir ku rêç û şopa textoran biguhezim ber bi arasteyeke nû , taz e û ciyawaz ve ji rabûn û rûniştina kevneşop a heyî û rûniştî dûrbixim . Li Welatê min gotina bijîjk, textor an jî Dr, bi şêweyekî sexte bi pere, mewdan û berîkê ve tê girêdan . Ji bilî hin Awarteyan di dîroka tevgera rizgarîxawz a gelê kurd de. Hin Navine pîroz hene ku karîbûn van perwazên kevnoşop biçirrînin û saloxên kînkêş û çavnebar bidin mandelayê. Dibe behaneyên xelkê di cih de bin di hin mijaran de. Lê rastî ne tenê eve . ji xwe ji erkên me ye ku ev bijîjkên xwe terxankirin bo gelê xwe pêwîste em wana bînin bîra xwêner û şopînerên doza gelê xwe; mîna Dr.Fûad serkêşê şoreşa Şêx Saîd 1925, Dr.Nûrî Dêrsimî serkirdeyekî Şoreşa Dêrsimê, Dr.Şivan serkirdeyê PDKT, Dr.Mahmûd Osman bi erkê serokê karûbarê derve yê şoreşa îlonê bi M .M.Barzanî re, Dr Heznî Haco ku piştî derçûyîna xwe ji zanîngehê berê xwe da eniyên şoreşa Başûr bo pêşkêşkirina alîkariya nojdarî bo birîndarên şoreşê û Dr.Kendal şehîdê şoreşa Bakurê Kurdistanê bû. Bi rastî textorên me dikarin van mînkan bikin bingeha nivîsandina dîrokeke zêrîn, daku guhertinekê li ba xelkê di nerîn û derhişê wan de çêbikin. Textor êdî ne ew kesê perehez, keysbaz, nandoz û malûmewdanperwer e, berevajî van hemî hizr û ramanên çewt . ew dimîne mînakeke rewşenbîrane ku di nav gel û tevgera xwe de dijî, alîkariyê dike û eger jê bê xwestin dişe serkirdeya tevgera siyasî bike . Ne tenê wisa , lê jê wêdetir dikare bibe damezrênerê saziyên zanist û rewşenbîrane di hemî biwarê jiyanê de.

---

**Li Nexweş... Dumahîk**

vegerî karê xwe li welatê xwe bikî?

• Navê min Selam Mihemed Hesen e, sala 1972an, li gundê Hecîko-Raco/Herêma Efrînê jidayik bûme. Li sala 1990î, bi armanca xwendinê, Partiya Komonist a Sûriyê ez şandim dewleta Okrayîna. Li wir, min salekê ziman, 6 sal bijîşkiya giştî, 3 sal niştegeriya giştî û piştre 5sal niştegeriya dil xwendiye û li sala 2006an min xwendina xwe bidawî aniye.

Ji ber hezkirina min ji Kurdistanê re, sala 2006an min xwedî, kes û karên xwe li Sûriyê hiştine û li Kurdistana Başûr cîwar bûme. Piştî ku 2 salan min karê niştegeriya giştî de kiriye, li Hewlêrê yekemîn Navenda Niştgeriya Dil hatiye damezrandin. Ji wê demê ta roja îro, ez li wê navendê kar dikim.

Di çarçoya xebata min di wan salên borî de, ez bi gelek bijîşkên cîhanê re xebitîme, yên ji Almanya, Hindistanê, Brîtanya, Holenda, Nemsa û Emerîka.

2- Li Qamişlo, te singa çend kesan vekir û encamên wan niştgeriyan çawa dinirxînî?

• Bi rastî, ji min re xewn bû ku rojekê ez niştegeriyê li Efrîn, Kobanî û Qamişlo bikim, êş û janê ji dilê nexweşan derînim û jiyana wan biparêzim xweş bikim. Dema derfet hat, ez digel tîmeke ji 5 endaman ji Herêma Kurdistanê gihame nav xelkên xwe li Qamişlo, me 3 niştereyên serkeftî çêkirin.

3- Li gora hate zanîn, niştegeriya we di asta niştegeriya navdewletî de ye û ev yek cihê şanaziya me ye ku bijîûkekî Kurd bigihe vê asta zanînê. Gelo, li derveyî welêt te gelek karên wiha serkeftî kirine?.

• Belê, min bi hizaran Niştegeriya Dil li derve, çi ji zarokên piçûk û çi ji mezinan re serkeftî çêkirine.

4- Di ware alav û instrumentên niştegeriyê, tu nexweşxaneya «Dil û Çav» li Qamişlo çawa dibînî? Karguzariya wê û karmendên wê çawa dinirxînî?

• Bi rastî, alav û instrumentên ku li Nexweşxaneya Dil û Çav li Qamişlo bikartên, heman alav in ku li hemû nexweşxaneyên neştergeriya dil li cîhanê ne.

Spasî ji Nexweşxaneya Dil û Çav li Qamişlo û rêveberiya wê, û Desteya Tenduristiyê ku alîkarî pêşkêşî me kirin û erkê me bi serkeftî derbas bû, herweha spasî Dezgeha Barzanî ya xêrxwaziyê re ku tîma me ya bijîşkiyê şande Rojavayê Kurdistanê.

Ez gelek bextewer im ku yekemîn Niştegeriya Dilê vekirî li Rojhilatî Ferêt, li Qamişlo ser destê min çêbûye.

# Hevpeyvîn Bi Nivîskar û Şêwekarê Kurd Dr.Sêf Dawûd (Lewendê Dalînî) re



***Birêz Lewendê Dalînî, endezyarê Giyology, nivîskar û hunermendê şêwekar, di zimanê Kurdî de, xwedî nivîs û berhem e. Dostanî û hevaltiya wî bi hezkerên zimanê Kurdî , stranbêj, mûzîkjen, hunermend û helbestvanên Kurd ên mîna Seydayê Keleş re hebûye.***

***Eve çend sal in ku bi malbatî ew li derveyî welêt dijî. Li wir, wî bawernameya Doktorayê di zanista Petrolê de wergirtiye. Herweha, wî beşdarî di gelek simîner û pêşangehên hunerî yên şêwekariyê de kiriye.***

***Vêga, bi seredanekê ew hatiye welêt (Qamişlo), me xwest ku wî bi xwendevanên NEWROZê bidin naskirin û pirsên me jî ev bûn:***

1- Bi xêr hatî kekê Lewend, hêviya serkeftinê di hemû warên jiyanê de ji te re dikin. Tê çawa xwe bi xwendevanên Weşana Newrozê bidî naskirin û ezmûna xwe şirove bikî?.

2- Ji kengî ve tu bi nivîsandina ziman û wêjeya Kurdî mijûl î, û bandora kê li te hebûye?.Çi berhemên te yên çapkirî û destnivîs hene?.

3- Çawa te karî barê nivîsandina bi zimanê Kurdî, karê endezyariyê û şêwekariyê bi hev re hilgirî?.


4- Di van çend salên dawî de, berhemên bi zimanê Kurdî çi helbest, çîrok, roman…hwd bi piranî hatine weşandin. Tu naveroka van berheman çawa dinirxînî?. Di vî warî de tu çi dibêjî?.

5- Rola huner û wêje di danasîna gelan bi hev re çawa dibînî?.Gelo hunermend û nivîskarên me li Ewropayê doza gelê xwe bi cîhanê didine naskirin û dost û alîgiran jê re çêdikin?.

6- Di vê rewşa navnetewî ya tevlihev û siyasetên dewletên mezin ku berjewendiyên xwe di ser her tiştî re girtine, weke rewşenbîrekî Kurd, bi nerîna te, ji bo wergirtina mafên xwe yê rewa, çi ji me Kurdan tê xwestin?..

7- Li dawiya vê hevpeyvînê, tu dixwazî çi bêjî?.

---------------------------





**Bersiv:**

**-** Navê min Sêf Dawid e, li Qamişlo sala 1960î ji dayik bûme û bi navê Lewendê Dalînî di wêjeya Kurdî de ez tême naskirin. Di dîmahîka heftêyî de dema ez suxteyê dibistanê bûm, derfet çêbû ku ji seydayê nemir CEGERXWÎN ez hînî Elfabeya Kurdî ya Latînî bûme û ji kaniya helbest û Kurdperweriya li nik Seyda vexwariye.

Di dîmahîka salên heştêyî de, min dest bi nivîsa helbesta kilasîk kir. Piştî xwendina gelek pirtûkan bi zimanê Kurdî, çi helbest, gotar, û roman… hwd, pey demek ne dirêj jî, min dest bi nivîsandina kurteçîrokê kir. Ta îro, 3 pirtûkên minî çapkirî hene:

1- Neteweperweriya Kurdî di Mem û Zîna Ehmedê Xanî de (Werger ji Ingilîzî).

2- Ramanek (Kurteçîrok).

3- Keziyên Mijê (Helbest).

Ji bilî wan jî, min destnivîsek (Roman) û yek (Kurteçîrok) û du dîwanên helbestan jî hene.

Di warê Akadîmî de, li sala 2020an, min bawernameya Doktorayê di Endezyarita Petrolê de ji Zanîngeha Endezyariya Bilind a Lêşbona/Ispanya wergirt

Ji bilî Kurdî, ez bi zimanê Ingilîzî, Erebî, Almanî û hinek Tirkî jî dizanim û diaxivim. Di bîrweriya min de û oda bavê min li malê ku her şev çend zana û aqilmend kom dibûn û bi hev re, hemî beşên jiyanê guftûgo û şirove dikirin, Bandora wan civatan gelek li min hebû û bi taybet di warê zimanê Kurdî yê paqij û resen de. Gelek ji wan mezin û aqilmendan û tevlî bavê min, tenê bi Kurdî zanîbûn û tu zimanên din bikar netanîn, lewma zimanê wan paqij bû. Û şense baş ew bû ku hin ji wan Elîkî, hin Omerî, hin Xerzî û bvê min jî Hevêrkî bû. Vêca ev diyalogên cûrbecûr di hişê min de cih girtine .....

10

**Hevpeyvîn ... Dûmahîk**

û ji min re bûne mîna bingeheke xurt û min sûde jê girtiye, bi taybetî jî dema min dest bi nivîsandina bi zimanê Kurdî kir.

Herweha dostanî û têkiliyên min bi gelek rewşenbîr û helbestvanan re hebû, lê têkiliyên direj û taybet bi seydayê Keleş re ku kesayetekî nefstenik, cansivik, neteweperwer û saxlem bû hebûn. Bi rastî, mn sûde ji seyda girt.

Di her astengî û qelsiya ferhenga min de, tim ew gotin û bêje ji min re sermiyan bûn, min ew di bîra xwe de tannin û di nivîsên xwe de bikar tannin. Ji milekî din ve, gelek caran bavê min ez bi xwe re dibirime şevbuhêrkên dengbêjan, bi baldarî min guhdariya stran, şer û kemançê dikir. Evê yekê jî bandoreke mezin li min kir, lewma ta niha ez ji stranên folklorî hez dikim û evîndarê zirnê û kemançê me.

- Çilo ji rojên pêşî ta roja îro min nivîs, endezyarî û şêwekarî bi hev re berdewam kirin, ew jî bi vî awayî bû. Ez gihiştim baweriyê ku hîna ji zikmakî ve huner bi min re hebû, lewma di jiyana min a rojane de ew bû beşekî giring û di baweriyê de bû çandeke nerînî û cihekî xwey taybet di hebûn û ramana min de girt. Ji xwe Zimanê Kurdî hebûna min e, lê endezyarî jî kareke ku ez pê abûriya xwe pêk tînim.

- Di dema mana min li welêt û têkiliyên me yên hunerî, ez bawerim ku nama hunerê navxweyî bû, di çarçova miletên deverê de bû, lê bi çûna min a Ewropayê û mana min li wir û dîtin û xwendina min ji çanda û hunera wan re, wê yekê ez û hunera min derbasî qonaxeke nû kirim, rengê şêwekariya min a kevn û nû tevlî hev bû, bêyî ku ez vî tiştî ji xwe re plan bikim yan jî xaçerêkeke hunerî ji xwe re vekim, xweber rengek, yan jî beşeke nû ji hunerê di tabloyên min de hate pêkanîn. Lê ji ber ku nerîna mina çavkî beşek nû ji xwezayê, hunerê, avahî, xelk (Rû, Beden)ê dît û



weke xwendina pirtûkekê, di damarên hişê min de kûr cih girtin û di tabloyên min de hatin bikaranîn.

Huner (Tablo) ew bi xwe çand e yan jî nameyeke (diyalogeke) di navbera miletan de, û ez bawer im min di riya pêşangehên ku li welatê Rojavayê min çêkirin, namek ji wan re hate şandin û gelek pirs hatin kirin, ev yek belû û xuya bû ku tiştek ji wan re hate dîtin û cihê şanaziya wan bû. Herweha ew bû cihê rihetî û kêfxweşiya min jî, ji ber ku ez gihame baweriyê ku nameya mina hunerî gihişte wan.

- Derbarê rewşa navnetewî û siyasetên dewletên mezin, di baweriya min de, wekî Kurd, berî her tiştî, yekîtî ji me re divê. Di vê rewşa tevlîhev de, pêwiste em nakokiyên xwe deynin hêlekê û li hember neyarên hebûna xwe, dest bidin hev. Mixabin ku dewletên xwedî hêz nema li mafê mirovan dibin xwedî, tenê ew li zêdekirina perên xwe û xurtkirina hêzên xwe digerin. Gereke siyasetmedarên me Kurdan lîstika polîtîkayê ya derve bi hûrbînî bixwînin û têbigihên, da ku bibin xwedî roleke çalak û mafên gelê xwe bicih bikin.

- Li dumahiyê, gelek spas ji weşana NEWROZê re ku ev derfet da min, û bi hêvî me ku her xebat ji bo doz û zimanê Kurdî armanca we ya yekemîn be û serkeftin para we û hemû dilsozan be.

**Gelek spas û her serkeftî bî.**

Ji tabloyên hunerî yên Dr.Sêf Dawud





# Rojaneyên Efrîniyekî di bin siya dagîrkeriyê de (4)

**Osman Îso**



Berbang keriyê tariyê rêş dike û di korta dawiyê de hildiweşîne, destan li hev dixîne û toza wan demên reş dadiweşîne.

Ro bi nazdarî ji hembêza çiyayê Lêlûn şiyar dibe û bi dilgermî çavên pelên zêtûnê radimûse û bi Tîrêjên xwe dîlana hêşyariyê di nav sirûştê de digerîne....

Kalê Xelo weke her roj ji dengê dîkê sibê ve hêşyar bûye, gulîstana xwe av dide û pelên hişk û zer û weşyayî kom dike û bi gurzek gul guldana şanaz li ber serî hevjîna xwe dixemlîne, û pêşa derî ancaq ava Ferêt paqij bike lê hema bi sê zerikan avdireşîne û kursiya xwe datîne û bêhneke kûr dikşîne tu dibêjî sakê êkê Efrînê bixwe yan di îçî kezebê xwe ke û tîne bîra xwe berê çawa cade û dîwarên xemlandî bi Yasemînan û darên Lêmûn û portiqalan xem direvandin û qisawet dişûştin û dil geş dibûn û gotina (Roj baş cîran) lezetek xwe hebû, te digot qey li nav zêtûna helawê û zêtûnê şikandî û yan pîvaz û temetûz û gêrmiya şe'î re tu dixwî yan tu li Mihemed Şêxo rihmetî guhdar dikî **Lê îro ????!!!! Ax îro !!!!** kalê Xelo çavgirî û melûl e û ji nişka ve û bi dengekî bilind got: Misto, Misto!! Bes tu mala xwe bibînî, mala bi dar û ber, îro hêştir û ker lê diçêrin...

Hevjîna Xelo şiyar bû, û bi lez hate ba wî û got: Qurban! Çend gûzên ên sala par ji te re bînim Kalê Xel: Gûz??!! _Ûştê êqil pir rindin nahêlin me re bixerife, qurban Misto bû saleke rihmetî bûye, Xwedê rihma xwe lê ke û cihê xwe Cinet be ...Û Zelo hevjîna Misto di kursiya biloq de bêçar e, ma qey te ji bîr kirî?! Çawa çetan di orta şevê de xwe di ser sûrê re avêtin hundirê hewşa Misto û gava Misto ê reben li wan hay bû dest kirin qirtika wî û bi şêweyekî hovane fetisandin û bi wa yekê nekirin bi ser de jî bi qundaqa Rûsiyê li orta piştê Zelo xistin ....ax ax Xwedê canî va teresan bibe û ji nişka ve me ji va tengiyê xelas ke... Bê Amîn kalê min.

Xelo: Lê Amîn amîn, amîn hezar carî amîn, ma tu çiqas dikî pitpit, ma ez berê nizanim ?!! Lê tu kêf dikî gava tu birînên zingirî der dikî .... Xwedê tu heyî ! Me bes bi benî te girtiye?!! Ancaq tu ji heq canî zaliman derkevî?

Nazo: Kino navê xwe li mino!!! Ez pitpitokî me ?!! Ez hişk di xew de bûm û te ez veciniqandim....

Xelo: Min!!!

Nazo: Erê te! Te ji bîrkir, nebû du deqe te bi dengekî bilind got: Heywax Misto hele were!!!.... Min got qey -Xwedê neke - bi te re linavhevketiye.

Xelo: Lê van kûçikina aqil di serî me de hêştine, mal û milik birin û talan kirin û wan û biznan ve dar û ber rût kirin... Hele mêzeke li cadê !! Ma tu zanî çi dirêdane?!! Bes Hêştir ji me kêmbûn!!

Hîn Xelo û nazo ve danûstandin (mîna diyaloga Kurdî) bi dawî nekiribûn giropek çete bi otombîleke bi ala Da'îşê û ala Tirkan xemlandî di nik wan re derbas bûn, û gava çavên wan yên birçî li kalê Xel ketin rawestîn û xwe ji erebê avêtin, û yekî deriyê erebê vekir, zabitek bi ritbe û yekî rih dirêj peya bûn.. hemû wek mêxan sekinîn û temene jê re lêxistin ....

Kalê Xel got: «Çêrê kûçikan bike çokî dîne kêlek xwe «...Naza min têkeve hundir.

Nazo: Xelê min, ez te bi tenê nahêlim û ez pîrejinek im!

Xel: Lê qurban here hundir, hev ne dêkê xwe nas nakin, dîn û îmanê van pere ne, û yê ji Xwedê netirsî divê me re jê bitirse...

Çekfiroşekî: Elselam eleykom hecî, Kalê xel bêdil silaveke bombekirî vegerand: Silla min jî eleykom .....

Yek ji nav wan berkenî bû, Wa xweçekfiroşî bi erebî got em dixwazin çend pirsan ji te bikin, lê xalê Xel gote wan: Howê ma yahrêf Erebî (ez bi Erebî nizanim) Yekî hûş serberdayî bê terbiya got: Qûm weqif, ma tehrêf howe mîn (rebe ser xwe ma tû nizanî ev kî ye).

Kalê Xel got : Pir di ser va erdî re derbas bûn û çûn û em mane, û ji tu kesî re ranebûme, kalê Xel li Deve (hêştir) mêze kir û got: Ez we rind nas dikim wîn kî ne... û kûr li çiyayê Lêlûn û Kela Semi'anê mêzekir û got: Û Ez jî xwe pir baş nas dikim, EM KÎ NE! .



# 8 sal in

## Pakrewanê nemir KEMAL HENAN... Her bi me re ye

Li taxa Eşrefiya Helebê, roja 31.01.2013Z, xebatkar, nivîskar, berketiyê zimanê Kurdî û berpirsê weşana we NEWROZ, bi guleyeke zikreş jiyana xwe ji dest da. Bi gewdê xwe, Kemalê Kurdhez ji nav me bar kir, lê hê jî ew bi me re dijî.

Di heştemîn salvegera pakrewanê nemir de, bi rêzdarî em wî bibîr tînin, û tevî hemû kul û derdên giran dibêjin, ew hêviyên te yên ji bo azadî, aşîtî û wekheviyê dê neçilmisin. Li ser wê rêyê her dê kar xebat berdewam be!




## Parlamentoya Ewropa bang li Tirkiyê dike: Demîrtaş azad bike

***Parlamentoya Ewropa da xuyakirin, zîndankirina Selahedîn Demîrtaş helwesteke sitemkarane ya rayedarên Tirkiyê ye.***

**January 21 2021**

Navenda Nûçeyan (K24) – Parlamentoya Ewropa da xuyakirin, zîndankirina Selahedîn Demîrtaş helwesteke sitemkarane ya rayedarên Tirkiyê ye û banga demildest azadkirina Demîrtaş û hemû girtiyên siyasî kir.

Parlamentoya Ewropa bang li Tirkiyê kir, di çarçoveya biryara Dadgeha Mafên Mirov ya Ewropayê de, hemû tometên li Selahedîn Demîrtaş û Fîgen Yuksekdag tên kirin, divê bên betalkirin û hemû siyasiyên HDPê, demildest bên azadkirin.



Parlamento, bang li Komîteya Wezîran ya Konseya Ewropa jî dike ku helwesta Tirkiyê ya redkirina biryara Dadgeha Ewropa ya Mafên Mirov û neberdana Demîrtaş di civîna 21›ê Adara 2021 de gengeşe bike.

Parlamentoya Ewropa ji ber hewl û nêzîkatiyên li hember Demîrtaş, berpirsên Tirkiyê şermezar dike û dibêje, zedetirî çar salan bi awayek sitemkar zîndankirina Demîrtaş, ziyanên mezin gihandine wî, malbata wî û partiya wî û bang li Tirkiyê dike ji gavên çewsandina wî dûr bikeve.

Ev helwesta tund a Parlamentoya Ewropa di demekê de ye, îro Wezîrê Derve yê Tirkiyê Mevlut Çavuşoglu û Berpirsê Siyaseta Pêwendiyên Derve ya Yekîtiya Ewropayê Josep Borrell civiyabûn û Çavuşoglu gotibû ku Tirkiye dixwaze pêwendiyan bi Yekîtiya Ewropa re baş bike.

## Efrîn ev 3 sal in ji aliyê çeteyan ve tê talankirin û şêlandin!

Di bîranîna şerê dewleta Tirkiyê li ser Efrînê, Lijneya Rêvebirina Navendî ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) daxuyaniyek weşand, ev e li jêr, hin xalên wê ne:

«…Îro careke din eşkere bûye ku tu xêra dijminahiya li hemberî gelê Kurd, ji tu kesî re tuneye. Li dijî şer û pevçûnê, divê zimanê diyalog û danûstandinê bê avakirin. Ev yek dê li devera me, azadî, aştî, wekhevî û aramiyê bi xwe re bîne. Di 3'yemîn salvegera dagirkirina Efrînê de, em careke din bangî hemû sazî û dezgehên Tirkiye û cîhanê û raya giştî dikin: Li hemberî dagirkirin, kuştin, talan û tawanên şer ên li Efrîn û Rojava em dengê xwe bilind bikin.»

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**